



Serê sibê dengê çûkan

The sound of birds in the morning

 LIDA Portugal

 Vilius Aistis Vilimas

 Hebûn Stembar

 5


 کورمانجی / English



Yulia, mêmê wê û keça wan a piçûk li Ukraynayê li gundek piçûk a bêdeng dijiyan. Yulia hez dikir ku her sibe bi dengê çûkan şiyar bibe. Qet nedifikirî ku ewê ji malê dûr bijî, an jî sibê bi dengê çûkan ranebe.

• • •


Yulia, her husband, and their little daughter lived in a small, quiet village in Ukraine. Yulia loved being woken every morning by the sound of birds. She never thought she would live far away from home, or not be woken up by the sound of birds in the morning.



Mêrê wê her gav gazinc dikir ku têra xwe pereyê wî tune ye û bi giranî dest bi vexwarinê kir. Wan biryar da ku şensê xwe li Portekîzê biceribînin. Dibe ku ji bo avakirina xaniyek li wir û avakirina paşerojêke baştir ji bo malbatên xwe bikarin zêdetir pere qezenc bikin.

...

Her husband was always complaining about not having enough money and he began drinking heavily. They decided to try their luck in Portugal. Maybe there they could earn more money to build a house and make a better future for their family.



Yulia piştî ku bi serfirazî li mala xwe ya nû bi cih bû dest bi kar kir wekî paqijker. Xebata wê ya bi xîret û tevgera wê ya bi rûmet ji hêla xerîdarên wê ve pir hate pejirandin. Ji aliyê din ve, mêrê wê dest pê kir ku her ku diçe xwe jê derdixe. Ji ber pirsgirêka wî ya vexwarinê, karsaz ji wî bawer nedikirin û ji wî re kar nedikirin.

...


Yulia adapted well to her new home, and she started working as a cleaner. Her clients really appreciated her hard work and her polite attitude. Her husband, on the other hand, felt more and more left out. Because of his drinking problem, employers did not trust him and would not give him work.



Rojekê wî dest bi qîrîna Yulia kir. Dû re wî dest bi lêdana wê kir. Bi taybetî dema serxweşiyê qêrîn û lêdan zêdetir dibû. Yulia ji bo xwe û keça xwe ditirsiya, lê wê nizanibû ku çî bike.

...

One day he started yelling at Yulia. Then, he started pushing her. The shouting and beatings got worse, especially when he was drunk. Yulia was afraid for herself and her daughter, but she had no idea what she could do.



Dema ku Yulia di dawiyê de neçar ma ku bi destê şikestî biçe oda lezgîn a nexweşxaneyê, wan jê re got ku şîdeta nav malê li Portekîzê pirsgirêkek mezin e. Wan jî got ku ew sûc e û divê ji polîs re ragihînin.

...

When Yulia finally had to go to the emergency room in the hospital with a broken arm, they told her that domestic violence was a huge problem in Portugal. They also said that it was a crime and she should report it to the police.



Yulia westiyabû û bi fikar bû ku keça wê ya piçûk her roj li malê şidetê bibîne. Yulia fêhm kir ku destdirêjê her dem hebû, her çend ew xwe bi awayên cûrbecûr diyar kir.

...

Yulia was exhausted and did not want her little daughter to grow up in a home where she witnessed violence every day. Yulia realised that the signs of abuse had been there all along, even if it took many different forms.



Yulia çû stargeheke jinan, li wir xwe ji her gavê bêtir ewle hîs kir. Ji dema ku serê sibê bi dengê çûkan ji xew şiyar dibû heta niha, wê wisa hîs nekiribû.

• • •

Yulia went to a women's shelter, where she felt safer than she had in a long time. She had not felt like that since she was woken up by the sound of birds in the morning.



LIDA Stories

lidastories.net

Serê sibê dengê çûkan

The sound of birds in the morning

 LIDA Portugal

 Vilius Aistis Vilimas

 Hebûn Stembar (kmr)

